

Ji Penûsê Jinê Rastiya Jiyanê

RAPERÎN

Dîrok: Mijdar 2023 Hejmar: 10 Biha: 1000



TÊKOŞÎNA JINAN A YEKBÛYÎ WÊ MÊTÎNGERÎ Û SIYONÎZMÊ TÊK BIBE

ROJEV

3

Em Şoreşa Jinê Diparêzin,
Li Dijî Tundiye Birêxistin
Dibin

NEZERIYE

4

Malbat û Keda Hundirê
Malê

JYANNAME

7

Sarya Ozgûr; Meşeke Bi
Ken û Bawermend

Li Dijî Dagirkeriya Herêmê Rêbertiya Yekbûyî ya Jin

Îro di pêvajoya ku em tê de derbas dibin de bêguman dînamîkên şerê cîhanê yê sêyemîn xurtir dibin. Ji şerê Rûsya - Ûkrayna heta nakokiyên navbera hêzên NATO û Rûsya, Ji dînamîkên şerê Emerîka û Sîn heta Îranê û heta derbeyên siyasî û leşgerî yên ku li parzemîna Efrîqayê tên jiyankirin û di dawî de heta Rojhilata Navîn îro di tevahî cîhanê de zengilên şer lê didin. Bêguman ev şer daneyên şerê cîhanê ne. Îro hêzên emperyalîst û kapîtalîst tevahî cîhan û bi taybetî Rojhilata Navîn vegeandina qada şer. Ev şer di dagirkirin û mêtîngkirina cihên nû de şênber dibe. Mînakên vê yên herî gunçaw jî çend mînakên wekî dagirkirina bajarê Artsahk ê Ermenîstanê, êrîşên berdewamî yên li ser Rojava, Başûrê Kurdistanê û Qadên Parastina Medyayê, dagirkeriya Îsraîlê ya li ser Filistînê ye.

Îro di şerên emperyalîst ên siyasî, aborî de bêguman êşa herî mezin karker, kedkar, gelên bindest û bi taybetî jin û zarok dijîn. Di heman demê de îro ev şerê ku parçe parçe, welat bi welat di cîhanê de tê meşandin şerên çînî û neteweyî yên navbera çîna serdest û bindestan in. Li tevahî cîhanê ji ber van berjewendî, nakokî û qeyrana hebûnî ya kapîtalîzmê mirovahî ber bi tunebûnê ve tê birin.

Dînamîkên Şoreşên Herêmî û Çarenûs

Lê çawa ku dîroka mirovahiyê dîroka van şeran in, ev dîrok di heman demê de dîroka serkeftinên bindestan e. Îro em li dijî faşîzm, dagirkerî, mêtîngêrî, kapîtalîzm û emperyalîzmê berdewamiya van serkeftinan tenê dikarin bi hêza xwe ya rêxistinî binin.

Di şerê emperyalîst ê parvekirina cîhanê yê duyemîn de gelên sovyetan li dijî faşîzma Hîtler çawa ku bi saya Yekîtiya Komarên Sosyalîst ên Sovyetan yekîtiya xwe avakirin û bi ser ketin divê gelên Rojhilata Navîn ên Kurd, Ereb, Ermen, Suryan, Turken, Çerkes, Fars û HWD. jî bi têkoşîna xwe ya yekbûyî li dijî şerê sêyemîn a parvekirina cîhanê bisekinin. Li dijî dagirkeriyê şoreşa Rojava ya jin, li dijî siyonîzma Îsraîlê têkoşîna gelê Filistîn, li dijî tarîtiya Talîban têkoşîna jinên Efxanî, li dijî rejîma Melelî ya Îranê ya faşîst serhildana "Jin Jiyan Azadî" dînamîkên şoreşên herêmî yên herî xurt in.

Li dijî şerê cîhanê wekî îro li çar parçeyê Kurdistanê, li Filistîn û HWD. dînamîkên şoreşên herêmî jî zêde dibe. Têgîna şoreşên herêmî di heman demê de nêrîna bingeşîn a tevgera me ya komûnîst e. Mezinkirin û rêxistinkirina vê dînamîkê erka herî girîng û bingeşîn a komûnîstan e. Şoreşa Rojava di heman demê de deriyê azadiya ev şoreşên herêmî ne. Dewleta Tirk a ku vê baş dizane ji ber vê yekê bi hemû hêza xwe êrîşa me dike. Hêzên emperyalî



dixwazin dengeyên siyasî yên Rojhilata Navîn û cîhanê li gorî pergala cîhanî ya nû ji nû ve binivîsin. Encama vê jî di her qorziyê cîhanê de şer e. Bi taybetî jî navenda şer Rojhilata Navîn e. Dewleta Tirk a dagirker û mêtîngêr ku dixwaze bi vê sayê di tevahiya herêmê de desthiladariya xwe ava bike serî li her rê û rêbazê dide. Şoreşa Rojava li pêşiya stratejiya xwe weke gefeke mezin dibîne. Li dijî vê, rêya serkeftinê ya tekane jî di tevahiya herêm û cîhanê de şoreş û sosyalîzm e. Li dijî şerên qirêj ên emperyalî îro çaresariya gel û jinên Rojhilata Navîn federasyona demokratîk û sosyalîst a gelên Rojhilata Navîn e.

Çawa ku bi tifaq û siyaseta hêzên emperyalî yên wekî Emerîka û Rûsyayê bajarên me yên wekî Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî hatin dagirkirin îro bi heman tifaq û siyaseta Ermenîstan, Filistîn û HWD. tê dagirkirin. Gelê Kurd çawa ku bi sed salan e li dijî dagirkerî û mêtîngêriyê têkoşîna azadiya xwe ya netewî dide meşandin

gelê Filistînê jî 70ê sal zêdetir li dijî siyonîzma Îsraîlê ji bo azadiya xwe ya netewî û li dijî dagirkeriyê li ber xwe dide. Şerê ku gelê Filistîn îro li dijî Îsraîlê dide meşandin şerekî mafdar û rewa ye.

Li Dijî Mêtîngêrî û Siyonîzmê Têkoşîna Yekbûyî Ya Jinan

Lê wekî ku em her tim tînin ser ziman serkeftina şoreşa civakî bi serkeftina

dagirker li ser xakên me zêdetir dibe, feraseta serdestiya mêr ku bingeha xwe ji kapîtalîzmê digire jinan hîna zêdetir hedef digire û dixwaze destkeftinên me û şoreşa me ya jin bifetisînin, bi rêbazên piralî yên şerê taybet, psîkolojîk, aborî û leşgerî dixwazin vîna jinê bişkinin û pergala me ya jin hilweşînin. Dewleta Tirk a faşîst bi êrîşên xwe yên hewayî yên ku di 4ê Cotmehê de li seranserî Rojava pêk anî tevahiya binasaziya welatê me hedef

şoreşa jinê mayinde dibe. Îro serkeftina şoreşên herêmî jî bi rêxistinkirina rêbertiya yekbûyî ya herêmî ya jin gengaz e. Parastin û mayindekirina destkeftinên şoreşa Rojava yên jinê di heman demê de bi yekîtiya têkoşîna jinên herêmê dikare mayinde bibe.

Di pêvajoya ku em ber bi "25ê Mijdarê roja navneteweyî ya têkoşîna li dijî jinê" ve diçin de di her qadê de tundiya pergala kapîtalîst a zilamperest li ser jinê hîna zêdetir û kûrtir dibe. Tundiya çînî, civakî û zayendî di encama van şeran de hîna berfirehtir dibe. Weke rastiyeke civakî, di hundirê malê de tundiya li ser jinê bi kûrbûyîn berdewam dike. Keda jinê ya hundirê malê hîna tune tê hesabandin. Hîna kevneşopiyên paşverû yên civakî jinê di bin zexteke mezin de digire û rê li ber her cure tundiya li ser jinê vedike. Divê baş bê zanîn ku tundiya civakî ya hundirê malê û tundiya pergala kapîtalîst a serdestiya mêr ji bingeşê ve du hemanên girêdayî hev in.

Êrîşên dewleta Tirk a faşîst û

girt. Tevahî saziyên me yên ku xizmeta binasaziya civakê dike hatin rûxandin. Bêguman êş û pîrsêrêkên herî mezin wê em jin bijîn. Dixwazin ku me bêçare bihêlin ku em ji welatê xwe derkevin. Rêya koçberiyê ji bo jinan rêya mirin û tundiya ye. Îro bi hezaran xwişkên me yên Filistînî, Efxanî, Ermen di heman rewşê de ne. Ev li dijî şerên kapîtalîst û emperyalîst mecbûriyeta rêxistinbûn, şer û yekîtiya têkoşînê dispêre me.

Li dijî dagirkerî, mêtîngêrî û siyonîzmê serkeftina şoreşê encax bi têkoşîna yekbûyî ya jinan misoger dibe. Em li dijî tundiya kesayeti ya fizîkî, psîkolojîk, aborî û HWD. dikarin bi yekkirina hêza xwe tîbikoşin. Em bi hilweşandina pergala kapîtalîst a baviksalar û serdestiya mêr dikarin her cure tundiya li ser jinê tune bikin. Yekîtiya têkoşîna jinên Kurd, Ereb, Ermen, Suryan, Filistînî, Efxanî û HWD. û rêxistina têkoşîna hevbeş rêya azadiya jinên tevahî herêmê misoger dike. Şiyara "Jin Jiyan Azadî" cihênameya me ya şer û têkoşînê ye.

Em Şoreşa Jinê Diparêzin, Li Dijî Tundiye Birêxistin Dibin!



Em ber bi 25ê Mijdarê ku di têkoşîna azadiya jinê de kêliyeke dîrokî ye ve dimeşin. 25ê Mijdarê jî bo têkoşîna azadiya jin û ji bo jinên tevahî cîhanê li dijî têkoşîna tundiya li ser jinê rojeke girîng e. Têkoşîna 3 xwişkên ku di sala 1960an de li komara Domînîkê bi têkoşîna li dijî faşîzma dîktatoriya Trujîlo li ber xwe didin û weke xwişkên Mîrabel tînanaskirin îro li cîhanê ala berxwedanê ya tevahî jinan e. Roja 25ê Mijdarê ku tê de sê xwişkên Mîrabel ji aliyê hêzên dîktatoriya Trujîlo ve hatin tecawîzkirin û di kendalekê re hatin avêtin û bi vî awayî hatin qetilkirin di sala 1999an de ji aliyê lijneya giştî ya Netewa Yekbûyî ve weke "roja têkoşîna û piştgiriyê ya navneteweyî ya li dijî tundiya li ser jinê" hat îlan kirin. Dîroka 25ê Mijdarê bêguman xwe dispêre dîroka têkoşîna jinên karker ên afirîner ên 8ê Adarê, Rosa, Clara, Sara, Berçem, Zîlan û Saryayan. Wekî duh îro jî siyaseta serdestiya mîr a dewletên kapîtalîst û emperyalîst ku tevahî cîhanê vedigerînin qada şer di destpêkê de jinan dikin hedef. Di bingeha siyaseta van hêzan de destdirêjî û tacîza li ser bedene jinê û tundî heye. Li çar parçeyê Kurdistanê, Efrîn, Serê Kaniyê, Girê Spî, Efxanîstan, Ermenîstan, Ûkrayna, Filistîn û tevahî cîhana ku hatiye zivirandin qada şerên qirêj tundiya li ser jinê weke siyaseta dewletê tê rêxistinkirin. Tundiya li ser jinê weke jenosîdeke dewlet û mîr tê sepandin. Îro rastiya ku li tevahî cîhanê têkoşîna û daxwazên jinan ên wekhevî,

azadî û edaletê dike yek ev rastî ye. Û li dijî kapîtalîzmê serkeftina vî têkoşîna bi serkeftina sosyalîzmê gengaz e.

Şoreşa me ya Rojava di 4ê Cotmehê de bi awayekî berfireh careke din bû hedefa dewleta Tirk a mêtînger. Dewleta Tirk a mêtînger û hevkarên wê jî şoreşa me ya jin ditirsîn, ji bandorkirina vî şoreşê ya li tevahiya Rojhilata Navîn ditirsîn, ji hêzên wê yê xweparastinê ditirsîn, ji jinên ku dibin iqtidar, ji vî û pêşengtiya jinê ya ku şoreş afirandiye ditirsîn. Ji ber vî bi tevahî hêza xwe êrîş dikin. Lê nikarîbûn bi van êrîşan berxwedana me bişkinin, bi êrîşên xwe yê dermîrovî nikarîbûn seriyê me bitewînin. Hewl dan ku vîna jina ku azadbûyî bi birçîbûnê, bi tîbûnê bişkinin. Vê jî tîre nekir bi rêbazên şerê taybet êrîşkirin. Polîtîkayên ku karibin jinan bi taybetî jî jinên ciwan ber bi bikaranîna madeyên hişbir ve bikişînin afirandin. Hewl dan ku bazirganiya bedena jinê rêxistin bikin, hewldana rêxistinkirina tevgerên ku xiyaneta şoreşê bikin dan.

Em di pêvajoyeke ku êrîş ji nû ve zêde bûne de 25ê Mijdarê pêşwazî dikin. Wekî her tim dîsa di refên herî pêş ên têkoşîna de jin hene. Ev heyameke ku ligel êrîşên dewletên dagirker û polîtîkayên şerê taybet, tundiya li ser jinê, kuştinên jinê, zewicandina di temenê biçûk de, zewaca zêde hîna zêdetir dibe ye. Ev jî bo her jineke ku me nikarîbû em xwe bigîhîjine wê raxnedayina me ye. Weke tevgerê pêşeng û rêxistinkirî ya li dijî feraseta serdestiya

mîr îro hîna zêdetir pêwîstiya me bi rêxistinbûnê heye. Me hîna serdestiya mîr bi temamî hilneweşandiye.

Zagonên me yê jinê destkeftineke girîng e. Divê di sepandina zagonan de em bi biryardarî û îsrar şopîner bibin. Divê li dijî serdestiya mîr îtirîza me hîna rêxistinkirî, wêrek û îsrarker bibe. Tenê ne li dijî dagirkeran, ji bo hilweşandina pergala serdestiya mîr pêwîstiya me bi şerekî duyemîn heye. Ji bo guhertina mîran, ji bo hatin dîtina keda me ya ku nayê dîtî, ji bo hatin bihîstina dengê me ya ku nayê bihîstin divê em rêxistinbûna xwe mezînin û xurt bikin. Divê deriyê malên me jî şoreşê re vebin ku em karibin azadiya xwe ya hundirê malê ava bikin.

Li Rojhilata Navîn a ku nakokiyên zayendî tê de pir kûr tînin jiyîn me pergaleke jinê ava kir. Şerê ku em li dijî dewletên dagirker û serdestiya mîr didin tenê ne şerê jiyîna şoreşa Rojava ye. Ev şer xwedî girîngiyê dîrokî ye. Em ê bi zanebûna rola xwe ya dîrokî bi rêxistin bibin û şer bikin. Wekî ku me desthiladariya mêtînger, çeteyên destbixwîn tîk bir, em ê bi biryardariyê hîna mezintir rê nedin dagirkeran. Em ê vî şoreşê bi serkeftinê tacîdar bikin û xeyalên şehîdên xwe pêk bînin. Em li dijî pergala serdestiya mîr careke din dengê xwe bilind dikin. Em ji Clarayan, Heta xwişkên Mîrabel, ji Işîk Kûtlûyan heta Şengûl Boranan, ji Saryayan heta Avaşînan, ji Sarayan heta Arînan, ji Nagehanan heta Rûkenan bi bedêlan, bi xwîn,

bi can, bi serhildan û rihê xwe yê têkoşîna û bi baweriya xwe ya şoreşê gîhaştin van rojan. Em bi hêza xwe ya leşgerî ya ku şoreşa Rojava afirand gîhaştin van rojan.

Em jinên ku ji axên dagirkirî yê Efrîn, Serê Kaniyê, Girê Spî tê ne. Em mecbûr hatin hiştin ku ji ax û bajarên xwe koçber bibin, em hatin qetilkirin. Û hîna di herêmên dagirkirî de tundiya li ser jinê berdewam dike. Her roj jinên qetilkirin, rastî tacîz û destdirêjîyê tînin, tînin revandin û dest tê danî ser mal û milkên wan. Lê em dev ji têkoşîna xwe bernadin. Em piştî xwe didin şoreşa xwe û li ber xwe didin. Em şoreşa Rojava li dijî serdestiya mîr weke mewziyekî diparêzin û ji bona wê şer dikin. Em rêhevalê xwişkên Mîrabel ên li çar Kurdistanê ne ku li dijî dîktatoriya Trujîlo li ber xwe didine.

Em jinên Kurd, Ereb, Ermen, Suryan, Çerkes, Êzîdî, Efxanî yê ku li dijî dîktatoriyan ku bi Trujîlo ve xwedî heman ferasetê ne, li çiyayên azad, Filistîn, çar parçeyê Kurdistanê, Rojava – Bakur û Rojhilatê Sûrî, Efxanîstan û hwd. li ber xwe didine. Em ji vir xwişkên xwe yê Filistînî yê ku li dijî siyonîzma Îsraîlê li ber xwe didin, Filistînê diparêzin û ji bo azadiya Filistînê şer dikin silav dikin. Em hêzên gerîla yê ku li çiyayan li dijî dewleta Tirk a mêtînger a faşîst û xiyaneta PDKê şer dikin silav dikin. Di vî 25ê Mijdarê de em careke din bi dengê xwe ya herî bilind dibêjin; Em ê tundiya mîr-dewlet a li dijî jinê tune bikin.

Malbat û Keda Hundirê Malê

Malbat ne saziyeke ku ji destpêka dîroka mirovahiyê de heye. Di asteke diyar a pêşketina civakî de, bi derketina holê ya milkê taybet pêk hatiye. Di her pergaleke civakî ku pêşketiye de saziya malbatê rastiya guhertinan hatiye, lê koletiya jinê berdewam kiriye.

Di heyama civaka komûnal a ku mirov tê de civakî bûye de, jiyana bi pêşengtiya jinan dihat rêxistinandin. Jinan civak bi rê ve dibirin. Her tişt eydî civakê bû. Têkiliya navbera jin û mêr wekhev bû. Dema ku hilberana zêde derket holê, ev di destê mêr de vegeriya milkê taybet wê demê têkiliya wekhev a navbera jin û mêr guherî. Heta wê demê ajara zarokan li gorî dayikê dihat diyarkirin û zarok bi berpîrsiyariya malbatê ya

bikin, ajalan biçêrînin hebû û bi vî awayî avaniya malbata pir zarokî derket. Erka jinan a esasî derveyî karên derve yê wêkî erd, xwedîkirina ajalan xizmetkirina mêran bû. Li vir di navbera derebeg, axayên axê û malbatê felah de cûdatî hebe jî tevahî jin bendewarên mêran bûn.

Di pergala kapîtalîst de jin bi awayekî girseyî derketin derveyî malê. Jinan wekî hêza erzan a kar di febrîqeyan de bi saetên dirêj dest bi xebitîna kirin. Erka jinan ya hundirê malê jî berdewam kir. Vê yekê barê ser milên jinê girantir kir. Vê rewşê di avaniya malbatê de guhertin çêkir. Derbasî avaniya malbata dendik ku ji dayik, bav û zarokan pêk dihat hat bûyîn.

Di pergala kapîtalîst de

di vê pêvajoyê de gelek mafên wekî mîras, berdan, zewac, perwerde, mafa dengdan û hatin hilbijartin bidestxistin.

Jinan dîtin ku dema ku karê hundirê malê li derve bê kirin beramberiya wê heye û dest bi xwedî derketina keda xwe kirin. Têkoşîna li dijî tundiya mêr a nav malbatê bilindkirin. Mêr ji bo ku karibin desthiladariya xwe berdewam bikin hîna zêdetir serî li tundiya didin. Îro kuştina jinan gîhaştîye asta komkujiyan.

Me li Rojava ye ku şoreşa jinê pêk hatiye di asta zagonan de gelek destkeftin bi dest xistin. Hejmareke mezin ji jinan derveyî malê jî dixebitin. Lê nakokiya navbera jin û mêr xwe dispêre milkê taybet. Heta ku ev bingehe ji holê ranebe

û ji nû ve hilberana hêza kar berdewam e. Têkoşînkirina ji bo pêşvebirina şoreşa me ya ber bi sosyalîzmê ve, dabînkirina civakîkirina keda hundirê malê, di nav malbatê de avakirina têkiliyên piştevan girîng e. Lê di asta dawî de rewşa jinê ya koletiyê di nav malbata ku teva milkê taybet derketiye holê berdewam dike. Li derve xebitîna jinan, civakîbûna hinek karên hundirê malê nakokiya zayendî ya navbera jin û mêr ji holê raneke. Zordariya mêr ya li ser bedena jinê cuda dike, diguherîne û ji nû ve dide şewegirtin. Ev jî di aliyekî de tê wateya mezinbûna bindestbûna jinê, lê di aliyê din de jî tê wateya kirdebûna jinê û têkoşîna wê.

Di roja me ya îro de di tevahî



hevbeş dihatin mezinkirin. Mêrê ku milkê taybet di destê xwe de digirt xwest ku milkê xwe weke mîras ji zarokên xwe re bihêle. Saziya malbatê ya mêr ku jin û zarok di bin kontrol û zextê de digire di vê pêvajoyê de derket holê. Mêr bi vî awayî jin kir milkê xwe yê taybet û koleya malê. Ev şer li dijî jinê di dîroka mirovatîyê de şerê yekem ê bindest û serdestan e.

Di nav saziya malbatê de cara yekem jin hat kolekirin, piştî mêrên xwedî milk jin û mêrên bê milk kirin kole û bi vî awayî civaka koledar derket holê. Di civaka koledar de mafa avakirina malbatê ya xwedî koleyan bû. Mafa koleyan a avakirina malbatê tunebû. Jinên kole mecbûr bûn ku weke cinsî jî xizmeta xwediyên xwe bikin.

Di pergala feodal de pêwîstî bi hêza kar a ku li erdan kar

jin tenê ji kolebûna mêr hat derxistin û ked, beden û cinsîtiya jinê hat daxilî pergala kedxwariyê kirin. Di pergala kapîtalîst de tevahî jin ji aliyê tevahî mêran ve hatin bindestkirin. Jinên ji tebeqeya serdest her çiqasî xwedî hinek îmtiyazan bibe jî jinên ji çîna bindest di aliyekî de dema ku weke hêza erzan a kar dixebite, di aliyê din de mecbûr e ku erkên xwe yê hundirê malê berdewam bike. Vê yekê jî di malbatê de nakokiyên navbera jin û mêr zêdetir kir. Vê rewşê malbat qels kir.

Xebitîna jinan a derve qadên azadiya qismî çêbû. Jinên ku di febrîqe û kargehan de bi mêran re heman karî dikin dest bi daxwaza "ji bo karê wekhev mûçeya wekhev" û dest bi têkoşîna mafên xwe kirin. Jinan têkoşîna wekhevî û azadiyê di vê pêvajoyê de bilindkirin. Jinan

tu sazîkirinên zagonî nikare serdestiya mêr a li ser jinê ji holê rake. Destkeftinên me yê rêxistinî û zagonî ji bo pêşxistina şoreşa jinê wê ji me re bibe bingeheke girîng. Divê şoreşa me dawî li têkiliyên kapîtalîst ku bi serdestiya mêr ve derbasî nav hev bûye bîne û derbasbûna asta şoreşa sosyalîst ji xwe re bike armanc. Jin tenê di pergala sosyalîst a ku milkê taybet tasfiye dike de û di tevahî qadan de bi cih girtina vîna xwe ya serbixwe dikare serdestiya mêr hilweşîne.

Dema ku jin li derve dixebitin azadiya aborî ya wan a qismî hebe jî, di axê me yê şoreşê de karên hundirê malê jî li ser milê jinan e. Hinek karên jinê yê malê civakî bûye. Lê vê carê jî jin mecbûr e ku bi gelek hûrgiliyên karên malê ve eleqeder bibe. Erkên jinê yê wêkî berdewamiya ajar

cîhanê de jin rolên malbatî û civakî qebûl nakin û li dijî vê têdikoşin. Em dikarin vê weke qeyrana malbatê bi nav bikin. U ev qeyran tenê ne qeyrana malbatê ye, di heman demê de qeyrana pergala serdestiya mêr a birêvebirina jinê û qeyrana hebûnî ya kapîtalîzmê ye. Qeyrana malbatê; encama hêrs, qebûlnekirin, serhildana jinê û encama têkoşîna azadiya jinê ye. Divê em sosyalîzma ku pergaleke azadîxwaziya jinê ye û tê de pergala milkê taybet û koletiya zayenda jinê tune ye ji xwe re bikin hedef. Divê em têkoşîneke ku feraseta kapîtalîst a ku jinê mahkûmî malbatê û xizmeta mêr dike hilweşîne mezin bikin. Divê em qeyrana yekîtiya bi nakokî ya serdestiya mêr û kapîtalîzmê kûr bikin û vê qeyranê veguherînin yekîtiya şoreşa civakî û şoreşa jinê.

Rêxistinbûna Me Azadiya Me ye

Me ji destpêka geşbuyina agirê vê şoreşê de ji bo bidestxistina mafê jinê têkoşîneke bêhempa meşand. Şoreşa me ya ku li hemû Rojhilata Navîn û cîhanê weke şoreşa jinê hatiye naskirin, destkeftinên ku bi bedêlên mezin hatine bi dest xistin îro di bin êrîşên mezin de ye.

Pergala civakî ya ku azadiya jinan sînordar kir, pergala ku jinan dike kole bi rêya saziyên wekî malbat, eşîr û hwd. ku li ser feraseta serdestiya mêr tê avakirin her tim hewl dide ku jinan bê deng bike. Bi taybetî ev siyaseta hîna ji temenê zaroktî û ciwantî de li ser jinê tê ferzkirin. Ligel ku jin êşên ew qasî mezin dijîn jî îro ev siyaseta pergala serdestiya mêr vê siyaseta xwe li ser jinê kûrtir dike.

Ji bo şkenandina ev pergalên desthiladar ên serdestiya mêr pêwîstiya me bi vê şoreşê hebû. Ji bo ev şoreşa ku ji destpêkê de heta niha jin bû pêşeng û sembola wê ji berxwedana Kobanê ve heta Şengal, ji

Efrîn heta Girê Spî û Serê Kaniyê ji Hevrînan heta Barînan, ji Avestayan heta Arînan , ji Saryayan heta Zîlan di her qadê de bedêlên gelekî mezin û pîroz hatin dayin.

Hevrêya me şehîd Sarya Ozgûr a ku di berxwedana Kobanê de têkoşîn kir û heta dawî ji bo parastina xeta partiyê û di xeta azadiya jinê de şer kir û tevî kerwana şehîdan bû di heman demê de ji Bakurê Kurdistanê heta çiyayên Azad û Rojava pêşenga jinên ciwan bû. Piştî vê bi pêşengên jinên ciwan ên wekî şehîd Raperîn Dicle, Destan Temûz, Zîlan Destan di hundirê vê şoreşê de têkoşîna jinên ciwan li dijî dijmin bi bûyîna mortal berdewam kir.

Lê em ji bîra nekin ku îro tevî vê têkoşîn û destkeftinên ku hatine bidestxistin di nav civaka me de hîna feraseta bavixsalar û serdestiya mêr berdewam dike. Ligel ewqasî têkoşîn, bedel û destkeftinên me îro hîna tundiya li ser jinê berdewam dike û jin bêçare dimînin xwe dikujin, an jî tîr kuştin. Niha ji bo hilweşandina vê ferasetê dem dema me ye.

Di vê pêvajoyê de li ser van esasan em bi şiyara "xwe bi rêxistin bikin û têkoşîna xwe mezin bikin" hemleyekê didin destpêkirin. Em tenê bi hêza xwe ya rêxistinî dikarin li dijî serdestiya mêr û her cure kiryarên wê yên li ser jinê bisekinin û azadiya xwe bi dest bixin. Em dizanin ku piraniya civaka Rojhilata Navîn hîna bi çanda eşîr û ol ve girêdayî ye û li ser vê bingehê dimeşe. Heta niha di bin vê pergal û ferasetê de bi hezaran jinan û bi taybetî jinên ciwan ji ber hukmên vê çandê jiyana xwe ji dest dan û hîna jî ji dest didin. Rojane jin di bin navê namûs, ol û kevneşopiyên de tîr qetilkirin. Namûsa civakê li ser bedena jinê tê pênesakirin û bi vî awayî jin tîr xistin bin nîra serdestiya mêr. Li hemberî vê rastiye em tenê bi rêya rêxistinbûn û têkoşînê dikarin azadiya xwe bi dest bixin.

Îro pergalên kapîtalîst û faşîst xwe li ser keda jinan mezin dike. Bi meşandina şerê taybet dixwazin ku me ji rastiya me dûr bixin. Bi taybet jinên ciwan ên ku bi şiyara "Jin Jiyan Azadî" dixwazin ku dengê xwe di hundir vê şoreşê de belav bikin pêşengtiya jinên cîhanê dikin.

Rêbazên ku faşîzm û serdestiya mêr li ser jinê dide meşandin di kiryarên qirêj ên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê yên di herêmên me yên dagirkerî de şênber dibe. Revandin, kuştin, tacîz, destdirêjiya bedena ser jinan a li Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî, Efxanîstan, Ermenîstan, Filistin û HWD. dide xuyakirin ku rastiya pergalên kapîtalîst ên serdestiya mêr li her derê wekî hev e. Bi vê tê xwestin ku vîna jinan bê şkenandin. Îro sedema êrîşên ew qasî mezin ên li ser şoreşa Rojava ew e ku têkoşîna bi salên dirêj ên tevahî jinên cîhanê di şoreşa jin a Rojava de encam girt û şênber bû. Şiyara "Jin Jiyan Azadî" li dijî hemû êrîş û tundiya li ser jinê bû bersiveke dîrokî.

Her çiqasî ku dijminên me bi tevahî rêbazan hewldan ku vîna me û şoreşa me bişkînin û tîrsekê di dilê me de ava bikin têkoşîn û biryardariya me ev yek serûbinî kir. Ji bo avakirina yek rih werin em di cenga azadiyê de birêxistin bibin .

Em bang li hemû jinên ciwan ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikin werin bi yek deng û şiyara "Jin Jiyan Azadî" li hemû cîhanê bi yekkirina dengê jinan em serdestiya mêr û zincîrên koledariyê bişkînin û li hember pergalên faşîst û desthiladar têkoşîna xwe mezin bikin. Werin em bi yek dest û hêz xwe bi rêxistin bikin. Ev dem dema me ye... Wê tu kes nikaribe careke din serê me bitewîne. Dînamîka şoreşan a herî xurt jinên ciwan in. Wê demê hadê em bi hêza xwe ya rêxistinî ber bi azadiyê ve bi hev re bask vedin. Em azadiya asîmanan bi hev re bikeşînin.



Bangewazî: Şoreşa Jin: Em bi Hev re Nîqaş Dikin Hêza Xwe Mezin Dikin

Jin wekî sedsala 20emîn di sedsala 21emîn de jî ji bo "karê wekhev mûçeya wekhev" , rojakar a 8 saet, mafa dengdan, mafa berdand, nefeqa û mafa Kurtajê tîdikoşin.

Nifûsa cîhanê hema mabû 8 mîlyar e. Li gorî rapora 2023an a ku ji aliyê Fona Nifûsa Miletan hatiye amadekirin ji %44 jin û zarok nikarin li ser bedena xwe biryar bigirin.

Jin berdewamî di herêmên dagirkerî de tîr mecbûr hiştin ku ji axên xwe koçber bibin. Bi awayekî zêde rastî êrîşa cinsî tîr. Kedxwariya ked û bedenê ya li dijî jinê her ku diçe zêde dibe. Bedena jinê di pîşesaziya (endüstri) tîkîliyên cinsî (gan) de tîr zivirandin kalêrê û tîr spartin ku bibin koleyên modern.

Jin û LGBTyên kulidijî pergala heteroseksîst a serdestiya mêr tîdikoşin li dijî tavahî van inyatkirinan li seranserî

cîhanê bi rêxistinîkirina meş, grêv, dagirkirina saziyên hikûmetê, konferans û civînan tîdikoşin. Jin li dijî kapîtalîzm û mêtîngeriye xweparastina xwe rêxistin dikin, di nav şerên gel ên çekdarî, mufreze û gerîlayan de cih digirin.

Ev têkoşîn li Rojava Bakur û Rojhilatê Sûrî bi şoreşa jinê tacîdar bû. Em wek JKŞê yek ji kirdeyên vê şoreşê ne. Heta avakirina cîhanê bê ciyawaziya zayendî, bêsînor û bêçîn şoreşa me wê bidome. Dema ku em bisekinin wê şoreşa me serûbin bibe. Rêya me dirêj e. Em di vê rêyê de nikarin tenê bimeşin. Divê şoreşa me belavî tevahî parzemînan bibe. Weke rojaneyî û stratejîk rêya herî esasî ya parastina şoreşê ev e.

Em weke jinên şoreşger ên komûnîst ku şoreşa cinsî û rizgariya civakî bi hev re digirin dest û şoreşa jinê li ser vê

naverokê ava dikin dixwazin li ser bingehên nezerî yên şoreşa jinê, li ser hedefên wê yên stratejîk û rojevên politîk komxebateke hevbeş rêxistin bikin. Em dixwazin li ser cureyên çalakiyên ku dawî li kedxwariya netewî, çînî û cinsî bîne tecrûbeyên xwe parve bikin, bi tecrûbeyên cuda asoya xwe berfireh bikin. Em dixwazin li ser di avakirina şoreşê ya politîk û pratîk de şênberbûyîna nêrîna xwe ya nezerî û pêşbîniyên xwe bisekinin.

Dewleta Tirk a mêtînger ji bo tesfîyekirina şoreşa Rojava bê navber êrîş dike. Dewleta Îsraîl a siyonîst bi hedefa ku Filistinê bê Filistinî bihêle êrîş dike. Dewleta Tirk a mêtînger û dewleta Îsraîl a siyonîst ji heman ferasetê xwedî dibin. Ji tevahî Rojhilata Navîn denga şerê herêmî tîr. Têkoşîna hevbeş a jinên ji netewên cuda,

ji hindikaniyên netewî, ziman û olan dikare çarenûsa Rojhilata Navîn biguhere. Jin wekî li Rojava û Rojhilat dikarin agirê şoreşê pêxînin û pêşengtî ji şoreşa Rojhilata Navîn re bikin.

Di ev şertên ku nakokiya cinsî vegeyriyayê şerê zayendî, nakokiya çînî kûr bûye û her ku diçe cîhan di navbera serdest û bindestan de bi awayekî tund parçe dibe de em dikarin bi têkoşîna xwe ya yekbûyî zincîra koletiyê ya bavixsalar bişkînin.

Dînamîkên şerê cîhanê yê sêyemîn zêde dibin. Em dikarin bi perspektîfa şoreşa jin tevî şerekî gengaz bibin û vê pêvajoyê vegeyriyên têkoşîna rizgariya civakî ya bindestan. Em li bendê ne ku hûn bi vê perspektîfê di bingeha amadekariya heyama nû de bi nêrîna û pêşniyarên xwe tevî vê nîqaşê bibin.

JKŞ Şoreşa Jinê Çawa Digire Dest -1-

Nêrînên Bername;

JKŞ Tevgera jîn ku li Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûrî di xeta welatparêziya sosyalîst de têkoşîn dike ye. Tevgera me Rojavaya xweser û demokratîk ku di sala 2012an de hebûna xwe îlankirîye diparêze. JKŞê rêxistina xweser a jîn a TKŞê ye. Hedef û armancên TKŞê di heman demê de hedef û armancên JKŞê ne.

Ji bo ku şoreşa Rojava belavî Bakur û Rojhilatê Sûrî bibe piştgirî dike û bi tevahî avaniya xwe têkoşîna vê dide. JKŞê di heman demê de parastina xisleta azadîxwaziya jîn a şoreşa me ya ku di heman demê de weke şoreşeke jîn destpêkirîye erka xwe ya bingehîn dibîne. JKŞê xwedî avaniya kolektîf e (hevbeş). Di pêvajoyên biryargirtinê de mekanîzmayên kolektîf dide şuxulandin. JKŞê li dijî dagirkerî û mêtîngiriyê, li dijî kapitalîzm û emperyalîzmê rêbaza bi hev re xebitîna bi rêxistinên ku pêşxistin û parastina şoreşê ji xwe re kirine armanc dipejirîne û ji bo vê tevahî derfetan dixê dewreyê.

JKŞê di heman demê de tevgerîna girêdayî bernameya şoreşa jîn a TKŞê bi rê ve dibe û vê yekê kontrol dike. Têkoşîna li dijî serdestiya mêr weke erka TKŞê jî dibîne. Rêbertiya têkoşîna azadbûna jînê û mirovbûna mêr dike.

JKŞê têkoşîna rizgariya cinsî-netewî û çînî weke bitûnek dinirxîne. Jinê weke hêza pêşeng û veguhêrîner a vê têkoşînê dibîne. Ji ber vê jî di jîyan û qada rêxistinbûnê de, di maf û hiqûqê de ji bo jînê sepandina cîyawaziya pozîtîf diparêze.

Di bernameya TKŞê de perspektîfa şoreşa jînê ya JKŞ bi bendên di beşa "Şoreşa Jin û Desthiladariya Dumend de" şênber dibe.

1. Tevahî sazî wê li gorî rêbaza temsîla hevbeş û wekheviya zayendî ya civakî xebatên xwe berdewam bikin, nêzikatî û têkiliyên ku vê astê paş bixin wê bîn redkirin. Tedbîrên zagonî û îdarî yên ku pê wekheviya zayendî ya civakî hatine xurtkirin wê di asta makezagonî de bîn misogerkirin. Li qadên ku şoreş nû gîhaştiye wê bi vê perspektîfê bê tevgerîn.

2. Weke misogeriya di xeta azadbûna jînê de avakirina civaka nû, jîn wê rêxistinbûna xwe ya civakî bi awayekî serbixwe berdewam bikin, di tevahî saziyan de ligel temsîla



hevbeş artêşa jîn û yekîneyên xweparastina jîn wê bîn xurtkirin. Di qada azadiya jîn de, di tevahî xebatan de rayeya zagondanîn jî di nav de tevahî maf wê eydî rêxistinên jinan be. Ji bo ku têkoşîna azadiya jîn û destkeftinên wê di tevahî jiyana civakî de pêk were wê tedbîrên pêwîst bîn girtin. Zextên ku têkiliyên malbatî û eşîrtî rê li ber vedike jî di nav de, wê li dijî serdestiya mêr têkoşîna bîrdozî û siyasî di her qadê de bê berdewamkirin.

3. Wekî ku şoreşa me weke şoreşa gel a demokratîk û şoreşa jînê di wesfa di şoreşan de ye, wê weke wesfa xwe ya desthiladariya gel û rêveberiya jîn wesfa xwe ya bûyîna desthiladariya dumend kûr bike, wê avakirina pergala jînê bê hedefgirtin.

4. Vesazkirinên zagonî yên ku li dijî sûcên cinsî, kuştina jînê û tundiya li ser jînê zêdekirina cezayî dihewîne wê bi biryardarî bîn sepandin. Wê dadgehên ku sûcên li dijî jînê tê de bîn darizandin bîn avakirin.

5. Bi armanca ji holê rakirina koletiya jînê ya hundirê malê û civakîkirina karên malê wê vezazkirinên pêwîst bîn kirin. Wê dawî li dîtina karê jînê ya lênihêrîna astengdar, nexweş û kal û pîran bê anîn. Jinên kedkar ên hundirê malê wê bîn xistin berfirehiya sigortaya gelemper û mûçeya bingehîn. Ji bo ku jinên kedkar ên malê bîn teşwîqî qadên xebatê yên civakî kirin wê vesazkirin bîn çêkirin.

6. Jiyan û şertên xebatê yên jinên proleter û niv proleter ku di xizmetên malê de bi mûçe dixebitin wê bîn başkirin û avakirina rêxistinên xwe yên

pîşeyî bê dabînkirin.

7. Kurtaj ji bo tevahî jinan wê weke mafê zagonî û bêpere bê dabînkirin. Kontrola welidînê weke berpirsiyariya jîn û mêr a hevbeş tê dîtin. Rêbazên wekî welidîn û hwd. ku derbarê biryara jînê ya li ser bedene xwe ya wê di misogeriya zagonî de bîn girtin.

8. Tu kes ji ber nasnameya xwe ya cinsî nikare bê biçûkxistin û rastî cîyawaziyê bê. Li dijî gotin û tevgerên li dijî nasnameyên cuda yên cinsî têkoşîna bîrdozî tê meşandin û cezayên zagonî tîn sepandin.

9. Bazirganiya têkiliyên cinsî û koletiya têkiliyên cinsî qedexe ye. Misogeriya jîyanê ya koleyên cinsî (gan) yên jîn, zarok û LGBTîan tê dabînkirin, ji bo sepandina şertên jîyanê yên hilberanê yên civakî tîn piştgirîkirin.

10. Li dijî şoreşê, dawî li sepandên wekî qelen, berdêl û zewicandina li dijî xwînê yên di avaniya civakî de tê berdewamkirin û vîna jînê tune dike tê anîn. Poligam (zewaca zêde) û zewicandina di temenê biçûk de tê qedexekirin. Bendên hevpeymana civakî bi biryardarî tîn sepandin.

11. Têkiliyên cinsî yên nav malbatê (înses) qedexe ye, li dijî vê têkoşînê tê meşandin, di rewşa ku tê jiyîn de di berferiya sûcên cinsî de tê cezakerin.

12. Lênihêrîna zarokan wê karê civakê bê hesabandin û wê zarok weke nirxeke civakî bîn qebûlkirin, wê berî û piştî welidînê 6, berî û piştî welidînê 3 meh îcazeya bi mûçe bê dayin mêr, wê şîr û hafedayên zarokan bêpere were dabînkirin, di tevahî saziyên ku di mezinahiyeke diyar de

vekirina odayên mêjandina zarokan, rawda û bexçeyên zarokan icbarî be.

13. Wê mafên zarokan bîn dabînkirin, sûcên tundiya psîkolojîk, aborî, fizîkî, cinsî û îstismara li dijî zarokan wê di berfirehiya sûcên giran de bê pênasekirin. Wê ji bo van sûcan dadgehên zarokan bîn avakirin.

Qismeke girînk ji bendên bernameyê yên ku hatine gotin niha ji aliyê Rêveberiya Xweser ve tîn sepandin. Di qadên desthiladariyê de rêxistinbûna jînê ya derûn, îradebûn û temsîla wekhev a jînê dabînkirîye. Ev li vir gaveke gelekî mezin û yekemîn e. Encax van destkeftinên şoreşê jî rizgariya jînê ya kamil neaniye lê deriyê rizgariyê vekirîye.

JKŞê şoreşa jînê ji şoreşa civakî cuda û serbixwe nafikire. Em hîna di şertên ku cudatiya dewlemend û xizanan berdewam dike de ne, em hîna di şertên ku wekheviya mafê ya kamil jîn û mêr nehatiye sepandin de ne. Heta ku karbeşiya zayendparêz ji holê ranebe, wekhevî nayê dabînkirin, jiyaneke komûnal nayê avakirin, keda hundirê malê nayê civakîkirin jîn nikarin azadiya xwe ya kamil bi dest bixin. Rizgariya jinan teva jinan, rizgariya civakê jî tenê bi komûnîzmê gengaz dibe. Ji ber vê yekê JKŞê têkoşîna li dijî serdestiya mêr û têkoşîna li dijî pergala baviksalar a kapitalîzmê bi hev re digire dest. Ji bo serkeftina şoreşa jînê û bi temamî rakirina ji holê ya serdestiya mêr hilweşandina kapitalîzmê hedef digire.

Sarya Ozgûr; Meşeke Bi Ken û Bawermend



Bi navê xwe yê malbatî Sibel Bulut, bi navê xwe yê tevgerî Sarya Ozgûr li axên şoreşê yên Rojava yekemîn şehîda jin a MLKPê. Rêheval Sarya li bajarê Dêrsîmê yê Bakurê Kurdistanê weke zaroka malbateke Kurd û Elewî ji dayik dibe. Ew hîna di temenê xwe yê gelekî biçûk de bi rastiya pergala serdestiya mêr a ku rastiya jinê tune dike rû bi rû dimîne û hîna di salên xwe yên bekelorya (lîse) de dest bi têkoşîna şoreşgertiyê dike. Di wan salan de komûnîstan nas dike. Di malbata wê de, li derdora wê gelekî rêxistinên cuda hene, lê ew bi zanebûneke gelekî zelal berê xwe dide tevgera komûnîst. Bi awayekî gelekî zû pêş dikeve û ber bi kadrobûnê ve dimeşe. Bi mêjiyê gelekî zelalbûyî ji bo ku şoreşgertiya xwe hîna zêdetir pêş bixe diçe zanîngeha bajarê Wanê. Li bajarên Bakurê Kurdistanê û Tirkîyê yên cuda xebatên xwe dimeşîne. Ew milîtaneke bi coş a têkoşîna ciwanan e. Li kuderê çalakiyê hesappirsîna ji dewleta Tirk a faşîst hebe rêheval Sarya êdî li wir e. Di rojên 8ê Adaran, 25ê Mijdarî û 1 Gulanan de ew di refên herî pêş de ye.

Di salên 2007 û 2008an de di qada ragihandina sosyalîst de dixebite. Pêwîstiyên partî û şoreşê çî be heval Sarya xwe paş ve nakişîne. Ew her tim dixwaze derbasî qada leşgerî bibe û sîleh di dest de şer bike. Û wekî di gotinên wê yên "her daxwazek ji xwe re rêyekê dibîne" xeyala rêheval Sarya ya şerkirîna jî ji xwe re rêyekê dibîne. Destpêkê berê xwe dide qada azad, piştî wê berê wê çiyayên li azad in. Weke jineke komûnîst ji bo pêşxistin û guhertina xwe ew bi daxwaz û bi coş e. Ew parêzvaneke bi îsrar a têkoşîna azadiyê jinê, milîtaneke ku li dijî têkoşîna

serdestiya mêr serî natewîne ye. Rêheval Sarya li çiyayan weke jineke gerîla dibe xwedî pratîkên serkeftî. Piştî li Rojava weke femandereke jin a MLKPê cihê xwe digire. Ji hemleya Hesekê heta Til Hemîs di gelek cepheyan de şer dike.

Şopdara Rêya Arîn Mîrkan

Dema ku bi hezaran çeteyên DAÎŞê Kobanê dagirkirin û piştî ku MLKPê di şerê Kobanê cih girt bêteredût bazda Kobanê. Tevayekî femandarên destanî yê şerê Kobanê şehîd Adil ve mil bi şerekî bêhempa meşand. Cihgirtina di şoreşa Rojava de ji bo wê her tim rastiyeke gelekî fêambar bû. Şoreşa ku xeyalên wê didît, ji bo pêkanîna wê ked û xwedaneke mezin dabû li Rojava pêk hatibû. Ji ber vê yekê şerkirin û şehîdketina ji bo şoreşa Rojava mêjiya wê gelekî zelal bû. Di dema şerê Kobanê de ev zelalbûn wiha anîbû ser ziman; "Em li Rojava ne, naçin, em ê heta dawî şer bikin, ger pêwîst bike em ê şehîd jî bikevin." Mayina ku di destpêkê de ji bo sekinandina pêşveçûna çeteyên DAÎŞê danîbû, vê carê ji bo ku şervanên YPG û YPJ kolanên Kobanê paqij bikin pêwîst kir ku rake. Rakirina wê xeter bû, rêheval Sarya bêyî ku hevalên xwe bişîne bi xwe çû û sibeheke meha Berfamberê di encama teqîna wê mayinê de bû stêrka mezin a asîmanê. Li dijî kesên ku digotin "Kobanê ket wê bikeve" wekî hezaran şehîdan bi fidakirina canê xwe serkeftina Kobanê diyarî me kir.

Rêheval Sarya weke femandereke jin di qada leşkerî ya ku weke qada mêran tê zanîn înzeya xwe davêje çalakiyên mezin. Wekî bi hezaran şehîdên jin ew jî tevahî ezberan hildiweşîne. Têkoşîna afirandina şeweya

femandariya jin dide. Di destpêka salên şoreşê de dibe yek ji avakerên artêşa jin a YPJê. Rêya xwe weke şopdara xeta têkoşîna azadiya jin a MLKPê dimeşe û bi pratîka xwe rê ji rêhevalên xwe yên jin re vedike.

Şoreşgertiyeke Şanaz; Rêheval Sarya

Dema ku Sarya tê gotin şoreşgertiya şanaz tê bîra mirov. Kenekî ku belavî tevahî rûyê wê dibe ji bo rêhevalên xwe bawerî û hezkirineke bêsinor e. Di mewziyên şer de hirezîqên wê dibe gule û li mêjiya dijmin dikeve. Sarya tu caran nebû ji şoreşgerên qalipgirtî, her tim xwe nû kir. Wê her tim bi hirezîqên xwe dorhêlên şoreşgerî şanaz kir û çî erk hebe bêteredût xwe avêt pêş. Her tim rê û rêbazên tiştên ku zor dihat dîtin didît. Tu carî nehatiyê dîtin ku wê jî ked dayinê xwe paş ve kişandiye. Dema ku hebe ew kar bi tevahî hebûna xwe tevî wî karî dibû. Ked dida, xwedan dirijand û her tim li ser serkeftina kar difikirî. Qasî ku ked dida li benda hatin dayina kedê jî dima. Cihên nobetê ku ji ber rêhevalên şehîd maye bi ev vîn û xwesteka mezin dagirt. Eynad e Sarya, dema ku tiştêk dixwe serê xwe heta dawî dibe. Di oxira tiştên ku bawer dike de dilfirehiya meşiyane ser mirinê de ji ber vê yekê ye. Di karê xwe de bidîsplîn bû. her tim zû dest bi rojê dikir. Berpirsiyariyên xwe yên partiyîbûnê tu carî ji eqlê xwe dernexist.

Di têkiliyên xwe yên rêhevaliyê de bi coş û kedkar e rêheval Sarya. Bisemax ked dida pêşketina rêhevalên xwe. Dema ku pirsgerêkeke rêhevalên xwe hebe bêyî ku bi axive hîs dikir. Ji bo çaresarkirina pirsgerêk û kêfxweşkirina hevalên xwe ked dida. Mirov dikarîbû di şexsê wê de hezkirineke bêdawî ya

rêhevaliyê hîs bike.

Derveî şoreşgertiyê tu xeyalên rêheval Sarya tune bû. Ew xwedî zanebûna ku "di jiyana jineke bindest de şoreşgertî ne hîlbijartineke, icbariyet e". Weke jineke di têkoşîna li dijî serdestiya mêr de rawestgehên pêvçûnê yên zehmet çêbûn, lê tu carî nesekinî. Dema ku malbat, berdilk li ber wê bû asteng bi wêrekî jê qut bû. Elbet weke gelekî jinên ciwan dema ku rêheval Sarya biryara şoreşgertiyê da pêvçûna herî mezin a yekemîn bi malbatê re jiya. Lê çî dibe bila bibe bawerî, biryardarî û eynada wê ya ku tu tişt nikare bihêle ku ew ji lêgerîna azadiyê û xeyalên xwe berde heye. Di dema ku rêxistin dibe de li dijî çanda bêrêxistinîyê, zextên malbat û derdora xwe ew bi têkoşînê mezin ên hundirîn û derve dibe xwedî qutbûn û qewastinên mezin. Ji ber ku wê ava giyana xwe ji jinên berxwêdêr ên Dêrsîmê yên wekî Besê û Zarîfeyan girtibû. Ew bi çîrokên lêhengiya wan mezin dibe û ji nifşên dû re xwe dibe ava giyanê.

Ew parveker e, di destê wê de çî hebe parve dike bi rêhevalên xwe re. Berî pêwîstiyên xwe pêwîstiya rêhevalên xwe difikire. Di jiyana wê de cih ji ezeziyê re tunebû. Divê her tişt li gorî pêwîstiyê biba ye. Erê rast e, ev hemû taybetmendiyên wê bûn, lê wê ev tevahî taybetmendî di jiyana xwe ya şoreşger de kêlî bi kêlî afirand. Ji Sîbelê Saryayeke nû afirand.

Nihaya ku dikeve ser milê me yê jinan, bi taybetî ya ku dikeve ser milê jinên ciwan şopandina gavên wê ye. Weke gotina wê ya di şerê parastina Kobanê de "Karê şoreşgeran çêkirina şoreşê ye" cihênameya çalakî û şoreşgertiya me ye.

Werin em ji bo pêşerojê bê tundî û azad têbikoşin

DIRBÊSIYÊ - Zubeyde Hidir

Mîna gelek jinan ez jî rastî gelek pirsgerêkan hatim û hîna jî berdewam dike. Malbata me her tim ji bo me hewl da ku em bixwînin. Lê min tenê heta safî 9'an xwend. Rewşa malbata min a aborî ne zêde baş bû. Malbata min zêde zext li me nekir. Lê ji aliyê civakê ve gelek zext hebû. Çûna sûkê şerm

dihat dîtin. Nedixwestin em ji xeynî xizmên xwe yên nêzîk biçin cem kesekî din. Şerm e ku pir biaxive, şerm e ku mêriv pir bikene, şerm e ku tu bersiv nede birayê xwe, şerm e ku mêriv bi rêkûpêk rune. Şerm e, şerm e, şerm e... Me nikarîbû çawa ku me dixwest bijîn..

Ez nû ketim temenê xwe yê 18 salî û ez bi xizmekî me yê nêzîk re zewicîm. Piştî zewacê

ez ducanî bûm. Pêvajoya ducaniyê pir zehmet bû. Dema ku zarok welidî min zehmetî kişand. Min nizanîbû ez zarokê xwe çawa bigirim, çawa têr bikim, çawa bişom. Dema zarok dest bi girî dikir ez jî pê re digîriyam. Min nizanîbû ku zarok nexweş e, birçî ye, an pirsgerêkek din heye. Ez bi xwe biçûk bûm. Wê demê ez her tim li keçên ku ji min biçûktir zewicîn difikirîm. Bi rastî jî zewaca di temenê biçûk de ji bo jinan zilmeke mezin e..

Wê demê malbata hevjinê min qelebelix bû. Jinan hemû karên malê dikirin. Karên malê di nav jinan de piranî diçû ser milê bûkan. Divê ez xizmeta hemû mêrên malê bikim. Tiyê min avê dixwaze, tiyê min ê din nargîle dixwaze, xezûrê min xwarinê di wextê xwe de dixwaze, hevjinê min dixwaze ku ez her tim li ber destê wî bim. Dema ku ez li dijî wan derketim, ez rastî her cure tundiyê hatim.

Min bi hevjinê xwe re gelek

nîqaş dikir. Min ji wî re digot ku ez di vê malbata mezin de zehmetiyek dijwar derbas dikim. Di dawiyê de min ew îqna kir û em hatin bajêr. Pirsgerêk niha kêma bûne lê dîsa jî ez xwediyê zarok û xizmetkarê mêr im. Ez ji aliyê aborî ve girêdayî wî me. Dem bi dem ez rastî tundiya derûnî û fizîkî tîm. Demek berê me nîqaş kir û li ser wê qedehê girt û avêt erdê, şikand. Di rewşên wiha de mirov xwe pir xerab hîs dike..

Piştî ku min dest bi tevlibûna xebatên JKŞ'ê kir, ez fêrî mafên xwe bûm. Niha ez dikarim bi hevjinê xwe re nîqaş bikim. Ez dibêjim ger tu li derve dixebitî ez jî li malê dixebitim.

Ez jê re dibêjim ku ew bi serê xwe nikare li ser malê zarokan biryaran bide û divê ji min jî bipirse.

Ev gav ji bo azadiya min girîng in. Ger em jin bibin yek û bi hev re têbikoşin, em dikarin zêdetir azad bibin.



Danasîna Fîlm: Li Dijî Bêdengiyê Qîrîna Jinan

Fîlma "Hişş Keçik Neqîrîn!" yek ji baştirîn nimûneyên sînemaya Îranê ye. Film li ser tacîz û destdirêjiya li ser zarokan e. Derhênerê fîlmê Pauran Derakhshandeh e. Ev fîlm di sala 2013 de hatiye kişandin.

Di fîlmê de jina bi navê Şîrîn, di roja daweta xwe de dema ku cil û bergên xwe yên spî li xwe kiribû, xizmetkarê binayetê dakuje. Naveroka fîlm li ser vê yekê hatin dadgehkirina Şîrînê ye. Herkes di roja daweta xwe de sedema kuştina Şîrînê ya vî zîlamî meraq dike.

Şîrîn tê girtin û dikeve lêpîrsînê, lê ew naxwaze xwe biparêze. Malbata wê neçar dimîne ku îdia bike ku keçika wan nexweşiya derûnî weke dîn bûye an ji di bin bandora madeyên hişbir de ye. Lê rastî ne usa ye. Parêzereke jin a serkeftî wekî xwişa xwe nêzî Şîrînê dibe û pê re diaxive. Dema Şîrîn çîroka jiyana xwe vedibêje êşa ku dikişîne derdikeve holê. Wê demê sedema kuştina wê ya wî mêrî tê fêmkirin.

Dema ku Şîrîn hîna 8 salî ye ajokarê malbatê Mûrat tecawizî wê dike. Sûretên wê yên tazî dikişîne û wê tehdîd dike. Her ku Şîrîn hewl dide tiştên xwe yên ku jiyankirî bibêje, kes guh nade wê. Di dawiyê de Şîrîn xwe sîcdar dibîne û bêdeng dibe. Muratd gefên xwe bi salan berdewam dike.

Her ku Şîrîn dixwaze dest bi jiyaneke nû bike, Murad wê tehdîd dike û ditirsîne. Şîrîn dixwaze xwe bikuje û demekê di nexweşxaneyê de derûnî de dimîne, lê kes fêma nake ku ka çima psîkolojiya wê şikestiye. Piştî salan bizirên hîseke nû dikeve dilê Şîrînê. Ew û hevalê xwe yê dibistanê Emîr Elî hez ji hev dikin, Şîrîn baweriya xwe bi Emîr Elî tîne. Ev bûyer dema ku dest bi jiyaneke nû dike tê serê wê. Di roja xwe ya herî şanaz de hemû xewnên wê nîvçe dimîne.

Şîrînê di wê roje de, di bîneyê de giriyê zarokeke keç dibihîze. Kesek bi berdewamî ji keçikê re dibêje 'hişt, bêdeng be!'. Şîrîn zarokatiya xwe bi bîr tîne û bi lez hewl dide wê zarokê rizgar bike. Di dema bûyerê de ji bo ku zarok xilas bibe neçar dimîne ku wî zîlamî bikuje. Dema ku Şîrîn çîroka xwe vedibêje li ser vê Mura tê girtin. Dema ku ew tê girtin derdikeve holê ku weke Şîrînê gelekî zarok ji aliyê Mûrad ve hatine tecawîzkirin. Lê malbatên zarokan ji bo ku navên wan ê malbatî xirap nebe ji Mûrad gilîker nabin.

Li ser vê yekê, parêzere Şîrîn ji dadgehek din dipirse:

"Çawa dibe ku her çiqas li vî welatî sî û pênc haletên destdirêjiya cinsî hebin jî yek mexdûr giliyê xwe nekiriye? Sedema vê yekê çi ye? Sedem çi ye dozger? Sedem ev e; Ji bo

parastina navûdengê mexdûr û malbata mexdûr, ji bo parastina navûdengê xwe di nav xizm û derdora xwe de, alîgirê sîcdar in û sîcê xwe vedişêrin. Kesê mexdûr çima û di bin kîjan navî de divê bi salan bi nefreta xwe bijî û dîsa jî dengê xwe neke û gazinan neke? Ji ku derê? Ma dibe ku ew ji peyvên ku ji roja ku em ji dayik bûne ve bi berdewamî ji me re hatine gotin? "Şşt! Bêdeng be! Bêhna xwe bidin!" "Keç naqîrin." "Keç naqîrin..."

Di fîlmê de, em dibînin ka rolên zayendî çawa bandorê li jiyana me dike. Ji bo piştgirî nede Şîrînê zextê li Emîr Elî dikin. Her tim ji mêran re tê gotin "mêr nagîrin" û bi darê zorê bi hêz xuya dikin. Di rejîma Îranê de mafê jinê yê xweparastinê nayê

qebûlîkirin. Şîrîn di dadgehê de ji dadweran re dibêje:

"Ez naxwazim tiştêkî biparêzim! Divê ez kê biparêzim? Cenazeyek rêve? Jixwe ez mirim. Dema ez 8 salî bûm mirim. Lê kesî guhdarî min nekir, kesî ez nedîtîm. Kesî dengê min nebihîst. Tu kesî"

